# Daxuyaniya Ragahandina Xweseriya Herêma ZAD ê, Li :((Hêrêma ku were parastin

**:Ji bo kesên ku li Kurdistanê berxwedidin**

.Em hemû bûyerên ku li Turkiyê diqewimin dişopînin-

.Em jî pişgiriya we dikin li dijî êrîşên dewleta Turk-

Em dizanin ku ev şerê dewleta Turk pertrkeke li hember encamên-hilbijartên yên ku li xweşiya serok Erdogan nehatine û yê ku vîna gel .napejrîne. Ev gelê ku xwe ji jêr heya jor birêxistin dike

Me ragahandina we ya xweseriya we bihîst, em jî li aliyê din yê-.sînor û di ser çiyayan re dixwazin li ser riya vê xweseriyê biçin

Em ji nêz ve  şoreşa konfederalîzma demoqratîk ya ku li Kurdistanê-.tê meşandin dişopînin

Em xwe di gelek xalan de nêzî we dibînin û bi taybet di lêgerîna we-.di xwebirêxistinkirina xweser derveyî projeya Netew Dewletê

Em bi baldarî li pêvajoya ku hemû pêkhateyên olî û etnîkî tê de-.beşdardibin temaşe û dişopînin

Em wekheviya di navbera hemû pêkhateye û zayendan de baş û-.erênî dibînin

Tevî ku em zanin dewlet hîna siyasetên qirkirin û bindestkirinê-.dimeşîne

Em jî rola tevgera jinê û cihê wê di nav şoreşê de bi çavekî mezin lê-.temaşe dikin

Di dawiyê de, em rêzê ji bo pirensîpen xweparastinê û xweseriya .stratêjîk digirin

Em ji herêma Notre – Dame dê Land (Zad ê) li Fransayê vê-daxuyaniyê tînin ziman. Ev herêma ku bi awayekî îlêgal hatiye dagir kirin. Ev bû 45 sal in ku pevçûneke berdewam heye li dijî projeya avakirina balafirgehekê. Me ev herêm parast û piştî vê yekê em li dijî hewildanên valakirinê di sala 2012 derketin, bi saya hewildanên xweparastinên cuda. Gelek kes li vir dijîn ku bîr û baweriyên cuda .hatine û xwe bi xwe bi rêxistin dikin bi awayekî fermî an ne fermî

Tişta ku li Kurdistanê anaha tê avakirin, ji aliyê gelek hêzan ve rastî êrîşan tê, û di bin bombeyan de tê hilweşndin, ev hêzên han jî Daêş û turkiyê ne-di demekê de Dewleta Fransayê li lehengên dijî Daêş digeriya, pesnê kurdan dida, û niha ji şerma re devê xwe venake û li şerê niha Erdogan li dijî tekoşerên kurd -di bin navê şerê li dijî terorê .-dimeşînin temaşe dike

.Ev jî şerm û bêbextiya mezin e. Em amade ne pêşwaziya wan bikin-

**Hevgirtin bi gelê bakurê Kurdistanê re yên ku di dorpêçê de-.ne**

**Hevgirtin bi kurdên ku ji aliyê nijadperestên turk ve rastî-.êrîşan tên**

**.Hevgirtin bi Rojavayê Kurdistanê re-**

**Traduit en kurde et en arabe par Gulistan SIDO**

**Bureau des relations diplomatiques de TEV-DEM**

**Khamichlo**

**Rojava**

**14-10-2015**